# Serlêdanên penaberiyê yên hemwelatiyên Sûriyê têne ragirtin

Berî niha vê salê, UDI biryar da ku çareserkirina daxwazên penaberiyê ji Sûriyê werin ragirtin ji ber guhertinên mezin ên li Sûriyê piştî ku rejîma Beşar el-Esed di kanûna pêşîn a 2024an de ket. Niha Wezareta Dadê li Norwêcê biryar da ku çareserkirina serlêdanên penaberiyê werin ragirtin. Tiştê nû çiye?

## Wateya wê çi ye ku çareserkirina serlêdanan hatiye ragirtin?

Gava ku îhtîmal hebe ku rewşa welatekî dikare di demeke zû de baştir bibe, wezareta edaletê dikare biryarê bide ku UDI çareserkirina daxwazên penaberiyê ji wî welatî rabigre.

Ragirtin tê wateya çaverêkirinê heya ku em agahdariyên kafî li ser rewşa Sûriyê wergirin, û ev jî li gorî bendên qanûnê. Di qanûnê de çend muhlet û qaîde hene derbara ka çiqasî doz dikarin werin ragirtin:

- Divê em bifikirin ka gelo di dest me de agahdariyên kafî hene ku em dest bi çareserkirina serlêdanan bikin ne derengtir ji piştî 6 mehan. Yanî ne derengtir ji 24ê kanûna pêşîn 2025.
- Heke em hîn jî di wê baweriyê de bin ku rewş pir ne diyar e, em dikarin dema ragirtinê dirêj bikin, lê ne zêdetir ji 6 mehan, heya 24ê hezîrana 2026an.

## Çima serlêdan hatine ragirtin?

Serlêdan hatine ragirtin ji ber ku rewşa Sûriyê ne diyar e û ne zelal e. Pêdivî ye ku di dest UDI de agahdarî û nêrîneke baş hebe da ku bikaribe rewşa ewlehiyê binirxîne da ku binirxîne ka te mafê wergirtina parastinê heye yan na. Gava ku em dinirxînin gelo mafê te heye tu mafê penaberiyê li Norwêcê bistînî, em difikirin ka gelo çi heye biqewime di pêşerojê de eger tu vegerî welatê xwe. Halê hazir rewşa Sûriyê pir ne diyar e. Agahiyên di dest UDI de têrê nake ku ew binirxîne ka wê xeter liser te hebe yan na heger tu vegerî welatê xwe. Heye ku rewş hêdî hêdî bêtir aram bibe, û heye ku ew aloz û dijwartir bibe.

Em rewşa Sûriyê dişopînin û di heman demê de em helwêsta welatên din ên Ewropayê derbara serlêdanên penaberên ji Sûriyê dişopînin. Em ê di 24ê Kanûna pêşîn a 2025-an de nirxandineke din bikin. Dibe ku em her weha dest bi çareserkirina serlêdanan bikin berî 24ê Kanûna pêşîn a 2025an heke rewş zelal bibe.

## UDI çawa rewşê li Sûriyê dinirxîne?

UDI tiştên ku li Sûriyê diqewimin dişopîne. Em ji gelek çavkaniyan agahdariyan distînin da ku em pêşveçûnên di warên ewlehiyê, rewşa siyasî û mirovahî li Sûriyê berdewam bişopînin. Em dizanin ku li Sûriyê tundûtûjî û pevçûnên çekdarî hebûne heta piştî ketina rejîma Esed, û ku hin civat ditirsin ka dê çi were serê wan li jêr desthilatdariya nû ya Ehmed Al-Şaraa. Di heman demê de em bi welatên din re li Ewrûpa di têkiliyê da ne liser ka ew dê çi bikin derbara selêdanên penaberiyê ên ji Sûryê.

UDI raporan ji Landinfo, ku nivîsgeheke serbixwe ye ku agahdariyên girîng li ser tiştê ku li welatên cihê, di nav de Sûriye, diqewimin kom dike. Hewce nake ku hûn bi UDI re têkiliyê daynin da ku wê agahdar bikin liser ka çi diqewime li Sûriyê.

## Tê bikaribê derbara rewşa Sûriyê de di hevpeyivîna penaberiyê de bipeyivê

Em nikarin serledana te çareser bikin bêyî ku em pêşî hevpeyivîne bi te re bikin. Hunê derfetê wergirin da ku hûn li ser rewşa xwe rave bikin û gelo dê çi xeter liser we hebe eger hun vegerin Sûriyê dema ku UDI dîsa dest bi çareserkirina daxwazên penaberiyê yên ji Sûriye  bike.

## Hûn êdî nikarin destûrnameya xebatkirinê a demkî bistînin

Eger tu ne çûbê hevpeyivîna penaberiyê, tu nekarî destûra xebatkirinê (kar) a demkî bistînê. Dema ku serlêdan bên ragirtin ji ber rewşa nediyar, em êdî nikarin destûrnameya xebatkirinê a demkî bidin. Em tenê dikarin destûrnameya xebatkirinê a demkî bidin berî çûyina hevpeyvînê eger îhtîmal mezin be ku serlêdanên ji welatekî dê werin qebûlkirin (bersiva erênî).

## Ger destûrnameya xebatkirinê a demkî a te hebe

Eger te destûrnameya xebatkirinê a demkî ji xwe hebe, tu dikarî kar bikî heya ku destûrname derbasdar be, lê gava ku destûrnameya te biqede ew dê neyê nûkirin.

## Ma tu dixwazî vegerî Sûriyê?

Eger tu dixwazî vegerî Sûriyê, UDI dikare alîkariya te bike û rêwîtiya te rêkbixe, û tu dikarî alîkariya dravî (pere) bistînî ji boyî ji nû ve li Sûriyê dest bi jiyanê bikî. Ev jê re «vegera welat bi piştîvanî» (assistert retur) tê gotin. Ger li welatekî din ji xeynî Sûryê mafê te yê rûniştinê ku bi kêmî şeş mehan derbasdar e hebê, tu dikarî daxwaza vegera bi piştîvanî ji boyî vegera wî welatî bikî.

### Mirov çawa serlêdana alîkariyê dike bo vegera welat

Pêdivî ye ku tu ji bo vegera bi piştevanî li ser malpera udi.no serlêdanê bikî. Yên ku li kempa penaberan dixebitin dikarin alîkariya te bikin. Eger tu serlêdana alîkariyê ji boyî vegera bi piştevanî bikî, divê tu serlêdana xwe ji bo penaberiyê **venekşînî**.

Eger serêdana te hate qebûlkirin, em ê bilêtan ji bo te bikirin û tu dê di roja çûyîne de an gava ku tu gihîştî Sûriyê, piştgiriya dravî li balafirgeha Osloyê bistînî.

Ger UDI-ê ji boyî rêwîtiya te ji te re bibe alîkar, divê belgeyeke rêwîtiyê a derbasdar di destê te de hebe.

- Heke tu ne ewle bî ka gelo belgeya rêwîtiyê a te derbasdar e yan na, tu dikarî ji me re telefonê vekî û em ê alîkariya te bikin.
- Heke belgeya rêwîtiyê a te li cem polîsan be, em ê wê teslîmî te bikin gava ku tu dê rêwîtiyê bikî.
- Heke di destê te de belgeyeke rêwîtiyê a derbasdar nebe, tu hîn jî dikarî ji bo vegera welat a bi piştevanî serlêdanê bikî û em ê hewl bidin ku ji te re bibin alîkar. Wê hingê pêdivî ye ku tu wekaletnameyekê ji me re bişînî ku heq didê me em formekê îmze bikin ku dihêle ku em kopiyekê ji belgeyên te bişînin balyozxaneya Sûrî. Balyozxaneya Sûrî jî dixwaze ku bi te re biaxive da ku piştrast be ku vegera te bi dilxwazî ye, ji ber vê yekê em hewce ne ku tu hejmara têlefona xwe bidî me.

### Tê çiqasî bistînî?

- Heke tu serlêdana alîkariya bi piştevanî bikî berî ku em serlêdana penaberiyê a te çareser bikin, tê 15,000 kronan wergrî.
- Heke te bersiva refzê wergirtibe û ji te re muhleta derketinê hatibe diyarkirin, lê daxwaza vegera bi piştevanî bikî berî ku muhlet biqede, tê 15,000 kronan wergrî.
- Heke te bersiva refzê wergirtibe û ji te re muhleta derketinê hatibe diyarkirin, lê daxwaza vegera bi piştevanî bikî piştî ku muhlet biqede, tê 5,000 kronan wergrî.

## Tu ne mecbûrî vegerî

Wacibê derketinê ji Norwêcê ji bo hemwelatiyên Sûriyê hîna jî hatiye sekinandin, ev jî tê wateya ku tu ne mecbûrî ku vegerî Sûriyê û ku polîs jî dê te neşînê Sûriyê.

## Pirsên te hene liser vegera welat a bi piştevanî?

Heke di derheqê vegera welat bi piştevanî de pirsên te hebin, tu dikarî bi xizmeta şîretkirinê a UDI re bi têlefonê liser hejmara 23 35 16 00 biaxivî. Piştre liser 7 bitikîne da ku tu bi UDI re biaxivî liser vegera welat a bi piştevanî.